

Kiriyyariya Roja Nû: ji bona erden Sûriye û Libnanê. 35 ilreyen Sûrî: ji bona welatén din 4 ilreyen ingizî. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerî.

# ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERINENDE: MİR Dr. KAMIRAN ALI BEDIR-XAN

Dîwan û gerfnendekariya  
Rojnamé: Bérât-Birc: Weqif Tabet, Telefona Dîwan  
nâ: 74-04; Telefona Mala Xwediye Roja Nû: 84-41.  
Edresa telg: Bérât-Rojanû.

## Biserxwebûna Kurdistanê

Ejens A.F.P. ji Tehranê dide zanîn: ji hikûmeta Iranê re, zeber hatiye dayin ko serekên kurdan qerar dane û mila partiya demokrasi a Azerbeycanê partiyek dantne bi qesda xwestina biserxwebûna Kurdistanê. Navê oti civalê kurdi, Komel e. Mezinahîya oti cival bîcîqas e; hîjî ne hatige seh kirin. Beri bi çend rojan vî civali nimînendeyen xwe siyandî bû. Tebrizê û niha ji nimînendeyen xwe rîkir Bakûyê, şaristanê sovyetistana û mezin.

## KURDEK QEHRMANÊ SOVYETISTANÊ

Ew bend bi destê Komendarê savyellî Pavel Nikolayev hatiye nîvisandin û di rojnama Dengê Niştimanî de, li Bérâtî hatiye çap kirin; li 28. Tîrmehê sala 1945. di bin hejmara 226.

Samant Sabantov, kurî mîletê kurd, nimînende ye li şîretzariya Ermenistanê a bîlind li Ertwanê û beri bi çar salan, gû bâ şerî dijminan. Komandar Sabantov, di pêşîya elemana de, şerî parastina Moskowayê kiriye; ji ber ko wî dizan bû, parastina payeteyî Sovyetistana, parastina Mîletê Kurd e, yê ko di sayaga selattin, ya Lenin û Stalin ketîye riya pêşveçûnê, bi jîyîneke kamiran bêxurdar bûye û devi ji koçeriyê berdaye û ji xwe re, gund avakirina û bûnê cotkar û dêmînat. Li sala 1944. elemana, bi qiwetîne mezin direfî Minsk û Bombruskiê dikirin; te leken sovyetî êrîgen elemana bi şûnda vegerandine, çepê û kozikên elemana perçîqandina û pêz ve ketîne.

Ordiya Sör bi destê Sabantov dora tabureke elemani girtîye û ev tabûr perişan kiriye. Di vê qomandê de, Sabantov bi zêrekti zora dijminan birîye û 447 serheng û segmanen elemani hêstrî kirine.

Di dereke din de, leşkeren sovyetî, di bin fermardanîga Sabantov de, yanzde berîrîgen dijmina bi şûnda zivirandine. Sabantov bi xwe, bi destê xwe, lê, sêzde bîlîler kustine. Careku din, Sabantov divíya bû di ava Narevê re bibore û wê allîye wê de serpîke deye: Sabantov û leşkeren pê re, eu kar bi timamî pêk anîne; û wîlo leşkeren sovyetîn din, bi selameti derbazi vê ave bâne.

Hikûmeta Sovyetistana bi awakî hêja, qedrî Sabantov û mîbranîya di wî girtîye û bi gerara civaterekiya Sovyetistana a bîlind, jê re nîzana «Qehermanî yekîtiya Sovyetistana» hatiye dayin. Samant Sabantov di sala 1909. de, der aza Karsî ji diya xwe bûye; malbata wi belengaz bû.

Di şerî mezin i berî de, der sala 1914-1918-an, dê û bayê Sabantov bi mihiacîrigê xwe aveti bûn Tiflis; û bavê Sabantov careke din cîhrînîstîna xwe guhazîte û çûye Abaranê. Sabantov, di Leningradê de, der zanîngeha «Hindîkahîyîn Welatalî gân rohîllatî, i Sovyettî des» xwendîde. Di sala 1938 an de, hattî bû bijartîn nimînendeyî erdê kurdi yê Alakazî, li ba Şîretzariya Bilind a Ermenistanâ Sovyettî.

## Gerandina Dewletekê

Hemî Welatîn Rohelatî Nizing û Navîn, welatîn çand û cotkariyê ne; erdê van welatana xurt in, têr ay in; xelk di gundan de rûdinîn, û dewlemeviye xekî, berî her tiştî bi hatînê ax û zevîyan gîrêdayî ne. Lîbelê, her wekî awayê xebata her tiştî, bi pêşveçûna zanîn û hinermendîy guherîye; di welatîn bersehatî de, xebata erdê, awayê xebatî guherîye; xekî edî ne mina hav û kalê xwe erdê dot dikin û tûv direşinî û bi palayîye mijûl in.

Erdê sist, bi isülîn û nûjen tête xurt kîrin; az bi halatîn nûvekar tête rakîrin, traktorîn gîrân dikevin sîna ga û qentiran, dema paleyiyê de, mekîne cîhî destan direge, û ji tovşîrandîn û heta dêrân, mekîne û hesinçawen ko bi motora dişuxulin, arkarîya gundi û cotkaran dikin.

Mîna berî, kulin ni karin, bi serbîşti bê berberîyeke dijwîr, pêş ve bîkevin û zevîyen gundîyan û bax û bîstanan bexçevanîn xîra bikin. Wezaretâ Çand û bazîrganîyê bi van karen hêja mijûl dibe, pispor, mopsîzan û karkerîn vê wezaretê, réberî û arkarîya xekîne; xekî hîni re û tevergerîn nûjen dikin, û her wekî fasî ji hatîye ditin, dema taluka kulyanî de, bi xekî re, dest bi dest, şerî neyar û dijminîn zad û giyan dikin. Ev wezaret ji bona selihandîna cînsî wehyanan, ga û çelek û hesp û qantiran, ji welatîn din cînsîn çak tînîn hindurê welet; bi coyan, avên çem û robaran diğînîn zevîyan û pê hatînê erdê ne bi daketina baranê gîrêdayî dimîne; an erdê ko baran lê na kevin; mîna erdîn Misrê, bi vî awayî bîkîri cotkariyê tîn.

Demêrî destengiyê de, bançeqe ko bi destê vê wezaretî hatiye danîn, tê arkarîya cotkaran; peran dide van û bi faizekê geleb hindik; û ko destê cotkara fireh bû, van deynîn xwe vedigerînîn ve. Ji aliye din her wekî mekîneyen cot û çandîniyê, traktor û hesinçawen din, geleb biha ne, bi destê vê wezaretê û arkarîya di vê, civat û komekîn gundîyan têne dayin; pênc, deh an bistî gundi diğînîn hev û du, ji xwe re, nimînendeyan dibîjîrin û civat an komekêk datfinin.

Ez civat û komekîn ji bona gundîn ko nimînendekariya wan dikin, mekîne, hesinçaw an tîşîn din ko hewce ne dikirin, dikebinî ko hatînîn erdê bi bîhakî xwe bête firotin, dilxwazîn gundîyan pêşke hikûmetî dikin, heqê gundîyan diparêzin û di vê babetê de, tevkariya hikûmetî dikin û pê xwesîya mîlet tête cih; ya ko armâna hikûmetî ye; û divê her û her armâna wê bîbe.

Kurd di cotkariyê de, geleb xurt in, û bi nav û deng in; lê di karê bax û bîstanan de, di karê dar û şekîyan de, her wîki erdê Cizîrê û Kaniya Ereban, kêm ay e, çol û berîye ye, ewna kin xwe bi êşînîn, û erdê vandebeh xêzîtan kêm in.

Lê gundiyanî me divê bidin eglî xwe ko rojek wê bê, û genim mîna berî bi ded salan, wê erzan bîbe û xwesîya ko fro di destê wan de ye wê here; ji ber wê yekê diwê zehbî bîde bîstan û darîstanan, û ev tiştî bi destê civat û komekîn gundîyan, bi rahebi tête qedandin; û û vê babetê de, hikûmetî hê şik arkarîya xekîne dike. Em kurd dibîjîn Şam şekir e, yê ko Şamê nas dikin, dinizan ko dora Şamê têr bax û hexe ye; û şûriyîa Şamê jê tê. Dora gundê xwe heşin bikin, bi darîn zînet û rewşê bixemîlnîn.

## PÊXEMBERÊ ME

« Dilovant û silawa Xwede le bit »

Ji gotin û tevgerên pêxemberê me ê mezin, me seh kiriye ko me divê hindik baxêvin û beriya ko baxêvin xweş bidin eglî xwe, gelo tiştî ko em dîkin bêjin, rast e an ne; heke rast e, divê emê bêjin û edî bi şûnda venegerin; gotina ko em dibêjîn divê bikêrîhaff be; bikêrî nefsa me; an ciranên me, an miletê me bê; me dît ko bi gotina me fesaflî wê bikeve nav xelkê an pê xirabî wê bigehe xelkê; çêtir e ko em dev ji vê gotinê herdin; meger ko em bi vê gotinê heqê xwe, heqê ciranen xwe an yê miletê xwe diparêzin; wê gave li çep û rast nîrlîn nîne, divê emê bêjin û li ser bisekinin, û têde pê bidin erdê; heq; heqê biçukê biçukan; heqê belengaze bellen-gazan jî; ji mertebe mîr û axan, wezîr û paşan; xurt û dewlemedan; zehf bîlîntî û mîqedestir e; pêşîya neheqî de devê xwe me girin; neheqî zîlm e, zîlm dijminê Xwêde ye; serê zîlm û neheqîyê divê bête percîqandin; pêşveçûna insanî raheft û selametîya wan pê ve girêdayî ye; yêñ ko şerî zîlm û zorkeriye; neheqî û pistekîliyê dikin, li ba xwedê meqbul in; xwedê arîkarê wan e, xwedê wan diğîfîne nîsret û zîrfirazîyê û mirovén wilo li ber dilê xelkê ji şîrîn in; qedrî wan tête girtin û ew pê serbilind dibin; heqê xwe bîzînîn, heqê xwe biparêzin, lê bi heqê xwe qail bîbin û je betir me xwazin.

### Strana Kurdi

## Hey La Miro!

Hey la Miro ! sibe bû, tavî lê da, tav hilatî; kula Xwedê Teala tê bi kulba, tê têketa malâ qumendare Kopê; Ehmedê Herazi, cendirmê Yuzbaşîyan, bê xebatê, di'bê çawa Tro, di pê bavê Salih, kekê Feridî, di rîka Wanê re diçû, vê teqtibê, teqtibatê; de heyla maqûlo: roni wa ne be, yazi fermana Rebê Aleme, heta fesadiya me Kurdan hebe, ev yekayan, li erdan tu car batmîş na be; di pê bavê Salih, kekê Feridî, dengê deng, hêja rexê.. maqûla; hey la Miro li min heram be... .

Hey la Miro... roni ne m'go; kese ki xwedanê xêra tu ne bû, cewabekê bisîna Newala-Kevir-Resê; ji Nûh begî re, bîbî kuştiyî apê tey Silêman begî, Derwiş begî, Izet Begî, Sodîqa kurê Guînasê, bi destê xwe vî mirand arû û Ocazê malâ Mîrza Begî; de hey la maqûlo: roni wa ne be, yazi fermana Rebê Aleme, heta fesadiya me Kurdan hebe; ev yekayan li erdan tu car batmîş na be; di pê bavê Salih, kekê Feridî, dengê deng, hêja rexê.. maqûla; hey la Miro li min heram be... .

Hey la Miro, roni, ne m'go bela şerîkî çêneba, Dayikê Korê, li wî himberî, ne m'go kula Xwedê Teala, tê bi kula, tê têketa çiyâcê rojka qamekê, can dest li şerî; ne m'go, tîvîngâ destî Izet Begî, Miro, sô tirjêz bazarîner. Izet Begî, ban dikir, Sodîqa kurê Guînasê, tê bavê xalê xwe be; tê bikuje teresé van dijminan û neyar; na wele, tê bajo serif; de hey la maqûlo: roni wa na be; yazi; fermana Rebê Aleme, heta fesadiya me Kurdan hebe; ev yekayan li erdan tucar batmîş na be; di pê bavê Salih, kekê Feridî, dengê dengbêja rexê maqûla... .

Hey la Miro, roni, ne m'go bela şerîkî çêneba, Dayikê Korê, li wî axpînî; ne m'go bela Xwedê Teala, mala carê, di berê ji me re, li hev du bîne; fro minê gola Kersê, ji teres dê û bavê neyaran dagirta, ji gola xwînê ezê vegeryama mîrata Muşî sevîti; minê sîktir bikara van romîyan; ezê li şûna wan rûnîstama; de hey la maqûlo.. derdê kurdan ez kuşîm; Kurdistani hêj ne gitâ roni û dawetê... .

Roni wa na be; yazi û fermana Rebê Aleme, heta fesadiya me kurdan hebe; ev yekayan li erdan tu car batmîş na be; di pê bavê Salih, kekê Feridî, dengê dengbêja rexê maqûla.. .

*Amâde: Strancîvîn*

Ji aliye din, di gundan de, zehf mirîşk, elo-elo, kevok, werdek û qaz bi xwedî bîkin. Ji liben dora gundan, xwarina van derdikeve. Lîbelê, gundiyan divê zehf bala xwe bidin van heyanan; gava yet ji van nesax dikeve, divê heme bête cihê kirin; koxikên van divê bêne spî kirin; mîna insana ev ji hewcedarî paqîjîyê ne, û erdeke qirêj û genî van diküje. Bi destê civatê cotkaran şirketine mezin dikarin bêne danîn ji bona çêkirina xwendegah û xestexanan. Zaroya divê bîkevin xwendegahan û nesax xestexanan; ko wilo ne bû selametîya mîlet, dikeve talukî. Bi destê civatê cotkaran dikarin şirketine mezin bêne danîn ji bona çêkirina nîvişk û penîr, qell û her texîl xwareyîn din; yêñ ko paqîj û xwesçekirî bi bîhayekî bas têne firotin.

Hingîvî ji, xwareyekî zehf hêja ye, gundiyan divê zehf bala xwe bidin vî tiştî ji; bi xebateke biçuk hatineke bas tête xistin dest, û ji aliye din zar û zêcen malê, pê devşîrvê û dîlxwes dibin.

Gava hatînîn welateki çak û zebîn in; û zêde têne rîkirin welatîn biyanî û pê pere tê hindurê welet û xelk dewlemedan dibin; û ew ji tiştîn ko ji wan re hewce ne, ji welatîn biyanî dikirin û finin; ji vî tiştî re, ji vî kirin û fîro tinî re, bîzîrganî tête gotin û pê dîsa wezareta Çand û bîzîrganîyê mijûl dihe. Di benda me a hejmara ko bê, emê bi vê pîrsî mijûl bîbin.

*Kevnezan*

# Tefsîra Quranê

79- Yê ko ji pêxemberê Xuda re itaatê dike, ew ji Xuda re ji itaat kiriye (yê ko bi ya pêxember kiriye, bi ya Xudajî kiriye), lê yê ko rûyê xwe jê dizivire, li ber Xuda berpirsiyar dibe; tu, pêxemberê min, ji emelê wan berpirsiyar na bî, me tu ji bona parastina wan ne rékiyire, tu rastiyê şanf wan didi û hew...

80- Ko te ji wan re tiştek got, ew vedigerinîn te û dibéjin: Li serser û li ser çavé me, em ji te re itaatê û ji Xuda re ibadetê diken, lê gava ew ji xafa te derdi Kevin, hin ji wan mizawiriyê diken û tiştine din dibéjin. Xuda emelê wan dibne ú tezvîrén wan dide nîvîsandin; dev ji wan berde, û xwe bi Xuda bigire, wekalet û sermiyaniya Xuda besî te ye.

81- Ew Quranê dixwinia, ma tê na gehin? Heke Quran ji nik Xuda ne buwa, ayêtîn wê, li hev ne digirtin û pîrsen û dî wê bi tevayî li hev siwar ne dibûn!

82- Gava mirovén minafiq, li ser zefer an şikestina eskerên pêxember tiştîkî dibîhsin, hemâ wan ew xeber di nav xelkê de belav dikirin, da ko dilê misilmanan sist bibe; heke wan ew xeber ji pêxember, an ji mezinan re bigotana, pêxember û serekân dikari bûn, ji wan xeberan ên bikérhati bibijérin û di nav xelkê de belav bikin. Heke ji kerem û mezinâhiya Xuda ne buwa, bîtenê çendek ji wan, ji destê şeytên difilitin, xelas dibûn.

83- Pêxemberê min... her kes ji cihadê dest bikişne ji, tu bi serê xwe, riya Xwedê da, dest bi ger û kuştine bike; ev ji te re hate ferz kirin û nav di misilmana bide, da ko ew ji, dest bi cihadê bikin û Xuda wan ji xirabiya kafiran wê bisitîrine, û dîle kafiran û bitîrsine. Ern, zor û xurtiya Xuda ji yêna kafiran hêj mezintir e.

84- Yê ko arkariya işekî baş dike jê, û yê ko arkariya işekî xirab dike disa, jêparmend dibe. Xuda bi her tiştî dikire.

85- Gava ji we re keseki silavek dike bi awakî hêj delaltir lê ew, vegerinîn, Xuda hizra her tiştî dike.

86- Xuda yek e û ji wi pê ve tu Xuda nîne; tu sık nîne ko ew di roja piştawiyê de, we dê bigîhsne hev û du, we dê bicivîne. Ma ki ji Xuda bêtir xwedîqerar e, û li ser gotina xwe disekine.

87- Ma çire hon li ser bêbextiya kafiran dubendîyê diken; herwek emelê wan ne çak bû, Xuda ew vegerandin kufrê. Ma mirorjya vén ko bi emrê Xuda ketine ser şaq; hon wan jê xelas bikin? Gava Xuda ji hinan distîne û riya wan şaq dike, edî tu kes ni kare arikariya wan bike û wan bigîhsne riya rastiyê.

88- Ew dixwazin ko hon ji weke wan kafir bikin û wilo bikin mîna hev; hon, ji xwe re, wan mekin heval, meger ko ew ji di riya Xuda de mihicir dibil;

ke wan dest jê beridin, wan bigirin û kû derê ji be, wan bikujin; ji wan ewle me bin, hevalî, arşkarî û sermiyaniya wan qebûl me kin.

89- Yê ko diçin û dikevin bextê miletekfî ko di nav beyna wi mileti û we de ehdeye heye û yê, ko ji kuştina we, an ji kuştina xelkên milete xwe dilteng dibin û dikevin bextê we, hon wan me kujin. Xuda bixwesta ew ji we mîrtir dibûn û wan dest bi kuştina we dikirin. Heke ew xwe didin paş û dest ji kuştina we beridin û aştiyê tekliî we diken, bizanîn ko Xuda, edî na xwaze ko hon direjî wan bikin.

90- Hon mileteki din dibînin ko gava pêşberî we de ne, xwe misilman didin zanfn û pê dixwazin ji we ewle bibin û gava vedigerin cem milete xwe, xwe kafir didin zanfn, û pê dil diken, ji wan ewle bibin, û her caro ko ji wan re tête gotin, bibin kafir, ew kafir dibin; heke wan desten xwe ji kuştina we ne kîşand, dest ji we bernedan, bi wan re aş ne bin, kû derê ji hon rastî wan tén, wan bigirin û wan bikujin; me ji we re destûra kuştina wan daye.

91- Divê bê sebeb misilmanek misilmanekî tucar ne kuje, meger ko ev kuştin hê hemdê wi be. Yê ko misilmanekî bi qeza kuştîye, divê dilekî misilman azad bike; û heqê xwfna kuştî bide, mirovén di wi, meger ko ew bi navê sedeqe jê diborin. Heke yê kuştî misilman e, lê ji peyayen miletekfî kafir e, divê xwînî dilekî misilman azad bike. Eger yê kuştî ji miletekfî ye ko di nav beyna we de ehdeye (peymaneye), fidya wi weke yekî misilman e; divê xwînî heqê xwfna kuştî bide mirovén di wi, û dilekî misilman azad bike. Heke ji bo azadkirine dilek ne ket dest divê xwînî du meh rojiyê bigire. Xwînî bi vi awayî dibe tobadarê Xudayê xwe. Xuda zana û fêris e.

92- Yê ko misilmanekî qedسان û bi hemda xwe dikuje, cezayê wi dojeh e û ew tédeher dimîne. Xuda jê dienire, jê re lanetê dike û ji bona wi ezabekî mezin li hev fine.

93- Geli bawermendino.... gava hon di riya Xuda de, diçin şerf xwe melezînîn, û misilman û kafiran ji hev û du baş nas bikin, û ji yekî re ko ji we re bi awayî misilmanan silevî dide, me bejîn tu ne misilman i; heke hon vi işî qedسان diken ta ko hon talanê wi bibin, bizanîn ko mal û dewleta spehstir li cem Xuda ye. Bînîn bîra xwe, gava hon ji misilman bûne, we mal û canê xwe bi kelîma şehadetê, xelas dikirin, piştî Xuda ji kerema xwe, hon gîhandîn rastiyê û piyê we, li ser riya dînê xwe qaim kir. Xuda bîna, bîhistiyar û zana ye, emelê we dizane.

94- Makengê mirovén bawermend ko bê mazeret mala xwe de rû-

dinin, weke serevanîyên riya Xuda dibin, yê ko bi mal û canê xwe cihadê diken. Xuda cihê yê ko bi mal û canê xwe cihadê diken, ji mal rûniştiyan qatek bilintir kiriye. Xuda mîcahid û mirovén bawermend yê ko ji bégaviyê di dema şerî de, mala xwe de rûniştiye, ji ên din, bi keremên mezin çetir girtiye.

95- Cihê wan ji ên din bilintir e, ew serfiraz in, piyariya Xuda û efîw û toba wi ji wan re ye. Xuda-efîw û toban dide, Xwedê dilîrm e.

96- Ji yê ko li gorî mîrân camîrfî ne kirine û azabdarén nesfa xwe bûne û di tengîye de, dest ji pêxember; û serekân dî xwe berdane, dema mirin de, melyaket ji wan, wê bipirse: Di dema hicret û cihadê de, hon li kî derb bûn; hon misilman in, an kafir in? Ew lê vegerinîn û bîbîjin: Em mirovén bê care û belangaz in, em ji Mekê der ne ketine, me ne dikarî bû. Melyaket wê bêje wan: Erdê Xuda mezin e, hon çîma weke bawermendîn, ji welîter de ne ketine û we zîlmî wan kafiran qebûl kiriye. Ew wê deme zendemayî bîmîn; mala wan bizdonekan dojeh e; û çûna wan ber bi dojehê ve, ci çûyneke têr êz û ezab e.

97- Bi tenê mirovén qels û jîn û zaro, ji ne derketina Mekê berpirsiyar na bin, ji ber ko wan ne dikarî bûn, tevdîra derkitinê ji Mekê, pêk bînîn û riya Medîne û dîf nas bikin.

98- Xuda, ji kerema xwe, di gunehîn wan bêçareyan dibore, ji ber ko Xuda efîw û toban dide, Xuda keremkar e.

99- Yê ko di riya Xuda de, ketine welatê xerîbiyê, ew cihen sitirandinê û arkariyê û zadên boş peyda diken û yê ko ji bo Xwedê û pêxemberê di wi, ji mala xwe derdi Kevin û dikevin riya mihiciriyê û téde dimîrin, sewâba wan li ba Xuda heye; Xuda efîw û toban dide, Xuda dilîrm e.

100- Gava hon di seferê de ne, û ji tîrsa destdirêjahiya kafiran nimêjîn xwe kurt diken, ji we re tu guneh nîne; kafir dijiminîn we ên kedar û aşikare ne.

101- Pêxemberê min... gava hon pêşberî dijiminan de ne û hon dixwazin nimêja xwe bikin, tu eskerê xwe bike du bir, bila birêjî wan rabin nimêjî û yê din pêşberî dijiminan de, bisekine û hemî ji çekîn xwe hilgirin û yê ko bi te re rabûne nimêjî, piştî riketekê herin pêşberî dijiminan û destê xwe ji tiştîn ko nimêjî pê xira dibe bikişne û bire din û bi te re riketa din timam bike, divê ew, bala xwe, her bidin dijiminan û çekîn xwe ji destê xwe bermedin. Kafir dixwazin ko hon çekî xwe ji destê xwe deyîn; bala xwe ne din wan, da ko ew ji nişka ve, bi ser we ve bigirin. Heke hon seba nesaxî, an ji ber baranê çekîn xwe hilnagirin, ji we re, ne tu guneh e, lê her hal çavéne we li dijiminîn we be. Xuda ji bo kufiran azabekî dijwar pêk anîye.

102- Ko we, nimêja xwe qeza kir, di rabûn, rûniştin û raketen de Xudayê xwe her bînîn bîra xwe û wexten tenahî û aştiyê de, nimêja xwe di dema wê de û bi aynîn wê, bînîn cih, ev ji bawermendan re ferz e.

103- Bi dijiminîn xwe sist me bin, bikevin pey wan, heke hon ji esa birsnî ditîrsin, ew ji weke we, ji ezabê wê, dê tîrsîyar bibin, lê di nav beyna we de ferqek heye, hon ji Xudayê xwe hêvidar in, ew ne wisa ne.

104- Pêxemberê min... me ji te re Quran, bi hikmén wê û rast û adil da dahatin, ta ko tu li gora emrê Xuda li ser dehwayen xelkî hikma xwe bîs; xema mirovén bêbext me xwe.

105- Ji Xudayê xwe efîw û toban bixwaze, Xuda efîw û toban dide, Xuda dilovan e.

106- Bi wan mirovan ge ko hev û du dixapnîn û bêbextiya nefsa xwe diken bi hev me ke ve, û xema wan me xwe, û bizane ko Xuda ji mirovén nekes û bêbext hez na ke.

107- Ew dildiziyan xwe ji mirovan vedişerin, lê ew nikarin nefsa û nepeniyen xwe ji Xuda vegerin. û gava ew tiştîkî dibéjin ko Xuda pê qail na be, Xuda wan dibilese û dibne, zanfnâ Xuda dora kafir û emelê wan digire.

108- Hon di jiyn û heyina dînayê de, arkariya bêbextan diken, lê divê ji bîr me kin, gelo di roja piştawiyê de li ber Xuda, ki bibe wekîl û arkare wan?

109- Yê ko bi kirina tiştîkî neçê ezabdare nefsa xwe dibe û hema tobe dike û efîwa xwe ji Xudayê xwe dixwaze divê bizane ko Xuda xefür û rehîm e, Xuda di suçen gunehkaran dibore.

110- Yê ko xirabiye dike û hemeke xane ko mirovî xirab xirabe xwe ye. Xuda zana û fêris e.

111- Yê ko xirabiye dike û wê davêje ser stoyê mirovekî bêsûc, divê bizane ko wi li xwe gunehke giran û buhtaneke mezin bar kiriye.

112- Pêxemberê min... heke ji feyz û arkariya Xuda ne buwa, hinêni ji wan, tu rîşaq bikiran; lê herwek roniya Xuda bi te re ye, ew bi tenê nefsa xwe şaq diken û xwe dixapnîn û zererê wan na gîhe te. Xuda ji te re kitab û hikmet da dahatin û te hînî tiştîn ko te ne dizanî kiriye. Kerema Xuda bi awakî mezin giyâhe te.

113- Bêtirî civanen wan û vêşarî bê xeyr in, meger ko ew bi dana sedeqe, bi kirina tiştîkî qenc an bi lihevanfa mirovan mijûl dibin; yê ko wan tiştî ji bo pêkanîna emrê Xuda diken, divê bizan, eme sewabeke mezin bi wan bidin.

114- Yê ko piştî aşikarbûna riya rastiyê, guh na de emrê pêxember û berê xwe dide rîkê ko ne riya bawermendan e, em wi, di roja piştawiyê de dispîren hevalen wi ên kafir û davêjin dojehê, dojeh ci cihekî têr êz ezab e.

115- Xuda di gunehîn mirovén ko tiştine diken hempa û heyberê wi, na bore; ji vê pê ve heçî guneh hene, Xuda di wan li gora



**Hemê Musê**

Weyil, weyil, weyi, Hemo Keko weylé... dilé min li din e, sed carf li din e, mi di sibehé, bi kubara sibehé re, Saré derdikeve ser bané bircé; dorbine li ber çavé xwe dafiné; bi deşta Berézé dimeyziné; nérí ko obak ji obayén ereba, kohné dirége erebl, di deşta Berézé de vegirif ne; mi di Téll-Schré bi sé denga kire gazi, go Hemo, keko, xwedé; xwedé bike, ezé di dû çavé keké xwe Hemé re, kiraskî melesi, kitaneñ kaxeti, şarkî amâdi na qeffinim; ezé çiqas xiyal û bala xwe didim deşta mfrata Berézé, deşteke şín e, mi di koné res i erebl tê de vegirif ne, kohneki res i erebl li peré kona ye, sé xort di bin vi konf de rüniqf ne; li seré wan sar û temezí ne, li piştä wan girädayî, piştî sal i, ecemine; di ber wan de, xencrê qapilme, xerzanfî ne; li desté wan de ye, şeqxaneyén botani ne, ewan her sé xortan; li Berézé, li ber hésiya koné reçé erebl rüniqf ne, bi qumaré dileyizin; hay ji bayé feleké tu ni ne.

Mi di Hemé Mûsê; bi sé denga kire gazi; ban dikir Téll-Schré, xwaké, bi xwedé qet hay û hesabé keké te ji wan peya tu nî ne; ewan peya ne è ger û xewka ne, è şayî û dawetan e, heker tu yeqin na ki, hatine ri. beké xwe, ji ciwaniyé mala bavé te bikşin...

Mi di, Téll-Saré, sé denga kire gazi; go weyil, weyil, Hemo, keko weyl; xwedé bike ezé di dû çavé keké xwe Hemé re, li dinya-yé ez ne minim...

Hin xalxala Hemo, di devé wî de ye; nérí carké, mij û dûmané, ji biné berika jérin, ji pozé kaniya Rés-el-Eyné, ji hewhewé pozé çiyayé Şingalé; mij û dûmané hevdû hilanfîne; selefik siwara, ji jérî ve, têne, dilezine; ez çiqas dinerim, nanerim, ez ne ma zanim ewan siwara ki û ki ne; ez ne ma zanim; ewan siwara ne siwaré mala Zalé ne; neji malâ Eyûb Temir Paşa zengozérîn. xwedé hebîna; Téll-Saré; tu rabe durbîne bîne; ezé li ber çavé xwe deynim; saxlixé van siwara hillâim.

Dürbin li ber çavé xwe danf; li biné beriya jérî li selefî siwara dimeyziné, nérí sé siwar in, ji jérî ve têne, dilezinin; siwârê pêgî mehfneke qumeti, sésalf di bin de ye, li bayé beze; túmê mfrata xernûbê disiriné; her du siwâr diduyayé; dikin na kin, bi hêla beze; bi siwârê pêgî re, na qedînin. Hin xalxala Hemé, di devé wî de ye; nérí li ber hésiya kohné reçé erebl, guha ha, ho li Hemé; férise welalet Samé; kilé çavé Tir kimani; keviré koziké, risasé erde... şevgeré nîvê şevé...

Ezizé MERZİKA

**Berdolavi**

Mi di Stéra Sibehé, Stéra Kuruxé li me zer da, mi di li me şin kir, gihayé şolé, nebaté hemû erda; kuro lawiko, mi di şevé çûpi, bave mi sevleke, di bazar min û te xeber da; mi di li me zer da Stéra Kuruxé, şewqa xive da bû, qesr û qonazé Hemek Hamo, pîké Tururliké; lawiko mi di mamârî firara, derkel nav eşîre, sebra dilé min Onbasî ye, ezé jé re rabitu selamlıxé; ezé bi

**Hemê Gozé**

De lè da, de lè da; pozberano de lè da; şerwalgino de lè da; mi di bi Eliyé Yunis ve, qeymegamé Zogé ve, çawigé Almedina ve, bi Bişaré Çeto ve, Qewmî çiyé ve, topa Reskota ve, li kozka Koraniyé da, dilé min helak e, sed carf helak e ...

Mi di bi Eliyé Yunis ve, qeymegamé Zogé ve, bi Bişaré Çeto ve, di ser kozka Keraniyé de, girtine tifaq e. Mi di matlîka desté Hemé Gozé, ji évara xwedé de, şaq. şaq e, mi di Hemé Gozé, sé denga ban dikir, dayé dérané, mi sünd xwariye, bi súnda mehkemé, bi súnda jinberdané, mi sünd dixwar bi telaq e; ezé ji kozik û meterisë, Koziké Kôraniyé na livim, heger tu yeqin na kf; lingé min di qeydé de, desté min li ser súrma matliyé de, ezé ji kozik û meterisë na livim; misté qeydé, ji xwe re li cem min e; li cem apé min i Yunis; di hebsa bêxwediya Stewré de; li holiya jorîn, di bêrika xeftané mi de, di mfrata pencerde; de lè da pozberano de lêda ....

Mi di déka Hemé Gozé, bi sé denga ban kir, Hemo, lawo de hela; sed carf bi mi hela... ezé kozké, ji ferxé mala bavé xwe re çékim, ji kevira û kelpîç; sé payî bê xwediyé Sela...

Mi di, Hemé Gozé, bi sé denga ban kir, dayé dérané, ez Hemé me; ez Hemé gozé me, ez keviré koziké, risasé erde me, ez melkemoté mewtî me, şevgérê şevé me; ezeké Téll-Schré me; ez deqmoqî navçavé Canbezáré desté Mûsê me, ez guré roja qewamé me; dayé dérané....

Ezizé MERZİKA

**EMAN, EMAN!**

Eman, eman, eman, eman; mi di buhar haff çaxé dilketin û kéf; kéf û benek xweş in, li ser xaniya, li ser doşké; li bin libéf. Mi di buhar haff, caxé kerengvaniya, xwezla min i bi wé gavé; min cihê xwe û bejna zirav, li bané bilind, tev de, daniya; gava mamûrê firara derketa nav Omerya, min é, navê kelké detal, ji çitikâ reş hilaniya...


Ber derské mala bavé min bi sergo ye; kükük Kanos gelki no ye; xera dikir civané bi ro ye; gidi bazé dila, ez li ser réké, tu li ser réké; ji xelké we ye, ez û tu ji bav û déké; heç di nav beyna her dilé şirîn xebet bidé, xwedé bike, giře ne dé; fiila saré li ber miréké.

Ez li bané, û tu li bané; mihibeta dila şirîn e, tu ni zanf.

Ezizé MERZİKA

**MIRÉKA CIHANÉ**

Germanistan bûye weliteki belengaz û perişan. Xelk di peren behrê de héviyâ hûr û mûran de ne, ko pîlén avê davêjiné. Ev perav ji saristané elemant Hamburg, 8 kilometir dûr e; dû û bav çâne nescîra comerdîya behrê; lavê wan nobedârîya ligî û mislîn ko hatine anîn û kom kîrin dike; di zivîstané de, cend perçeyen rîjû ko tê de ne, germî wê bide tifîk. Eve kar û dawîya zorkeriyé.



Dergehek ji yén saristané Pragé. Payetextî Çokoslo. vakyayé Prag, bajarekî gelek qedim û spehi ye. Têde sé zanînbeh hene. Xelké çekoslovakayé zehf hinerwer û şebatker in, çfredestîya hosteyen çekoslovakî dîlrbâne; pîpok, kasik, bilür, mekine û çek û silehîn vî welafti bi nav û deng in.



Avahîyen seyygonâ bi her awayî ji yén Welatîn Roavayî ne kêmîtir in; lê diwê nayê ji bîr kîrin ko di vî pêşvîcânî de, para Euripiya zehf mezin e; di bervahatina vî wetalî de; hitmela sinhet û zanîna frensîzi karine hêja pêk anye.

Ezizé MERZİKA